



ji Raya Giştî re

Her sal di 25'ê Mijdarê de, em Roja Cîhanî ya têkoşîna li dijî Şîdeta li ser bingeha Zayendî silav dikin , ku ev yek bangê jinan ye ku rewşa xwe li çaraliyê cîhanê binirxînin û derfetek e ku binpêkirinên bi her şeweyî ronî bikin. Roj roja ragihandina asta tundiya li dijî jin û derfetek ji bo hemû tevgerên azadiya jinê ku xwe binirxînin, bi taybet tevgerên jinan ên li Rohhilata Navîn û Bakurê Afrîkayê, herêmek ku şahidiya geşedanên siyasî, leşkerî û meydanî yê bi hev re girêdayî ye. Qeyranên ku bi giştî bûne taybetmendiyê girêdayî bi welatên herêmê ve .

Jin di bin rejîmên totalîter , otorîter de dijîn, ji ber pîvanên olî yê devjêber û qanûnên neolîberal hatine xeniqandin. Di çarçoveya qeyranên bingehîn de, ew diêşin şîdeta nav malê, bêparbûna ji xwendinê, nebûna pêşkeftina domdar û dadmendiyê civakî û binpêkirin û/an bêparkirina mafên xwe dibin.

Kirîz û şerên ku li herêmê diqewime, ne tenê aliyên siyasî û leşkerî ne, lê di serî de krîzên aborî, civakî û hizrî ne û bûne sedema zêdebûna tundiya bi hemû şeweyan, lewra jin bûne qurbanîyên şer û alaveke di destê hemû aliyên nakok de ye û di encamê de rastî destavêtin, tacîz û tundiya tîn. Ji bo piştrastkirina vê yekê îşaret bi şert û mercên jinan ên li Sûdan, Iraq, Filistin, Kurdistan, Yemen û Sûriyê bes e.

Pirsgirêka jin li herêmê (Rojhilata Navîn û Bakurê Afrîkayê) dikeve rêzên jêrîn ên pirsgirêkan û mafê xwe yê tam nagirin ku were ronîkirin û balkişandina li ser were meşandin. Ji ber vê yekê civak û sîstem jî di nava kulmek pirsgirêkan de dikevin, ji ber ku çareseriyê hemû pirsgirêkên heyî bi neçarî bi çareseriyê pirsgirêka azadiya jinê ve girêdayî ye, ji ber ku bingeha hemû pirsgirêkên civakî ye û kilîta çareseriyê hemûyan e. Ji ber vê yekê, bêyî ku li ser koka têgînên dualîteyên desthilatdar ên wekî (desthilatdarî û koletî, serdestiya egoya zilam a serdest li hemberî objekirin û kirdekirina jinê, serdestiya mêraniya desthilatdar û jinbûna bindest...), ne mimkûn e ku meriv desthilatdariya baviksalarî were çareser kirin û ne jî li ser bingeha wekhevîya rastîn a di navbera zayendan de demokrasiyek rast were avakirin.

Di serdema şoreşa teknoloji û zanistî û gerdûnbûnê de, mirovahiyê di keşf û dahênan de gavên girîng avêtine. Lêbelê, jin ji ber xirabûna şert û mercên giran berdewam dikin. Bi rastî jin di nava Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de bûye hedefa bingehîn. Amar û lêkolînên li ser binpêkirinên li ser jinan hovane ne. Raporên hêja yê navneteweyî diyar dikin ku di nava salê de her 10 deqîqeyan jinek tê kuştin. Welatên ku hîna li ser mafên jinan ên perwerdehiyê nîqaşan dikin û yê din hîn jî têdikoşin ku mafên herî bingehîn ên jinan di qanûnan de cih bigirin. mehrûmbûn û windakirina ewlehiyê.

Roja Navneteweyî ya Li Dijî Cîdakarîya Zayendî derfetek e ku em tecrubeyên têkoşînên jinan jî raber bikin. Em wek Hevgirtina Nada (Hevgirtina Jinên Demokrat ên Herêmê) tenê dikarin bîranîna hemû jinên têkoşer ên dîrokê silav bikin û wêrekiya wan kesên ku rûbirûyê rejîmên nedadperwer bûne û heta niha jî ji bo maf û azadiya xwe têdikoşin nas bikin. Têkoşîna jina îro hêza jinê û hêza wê ya guhertina rastiyê nîşan dide û destnîşan dike ku bi qasî dekadabûna jiyane, lehengî jî mezin e. Tiştê ku îro jin bi dest dixin xwedî bandorek mezin e, ji têkoşîna li dijî pergala gerdûnî ya ku li ser berhevkirina sermaye û şeran hatiye avakirin, bi têkoşîna olên siyasî yê desthilatdar, heta bi hemû şewazên têkoşîna li dijî terorê û dijberiya hemû têgîn û baweriyên zilamtiyê yê kevnar, dest pê dike.



Ji ber vê yekê li ser navê Hevgirtina Nada em dibêjin: Werin em vê rojê bikin platforma yekkirina axaftin û armanca hemû jinan; Werin em weke xeta sor a ku nayê qebûlkirin di daxwaza azadiyê de bibin yek. Werin em bigihîjin û xurtkirina demokrasîyê wekî amûra bingehîn a çareserîya pîrsgirêkên civakî; Werin em peyvê bi teoriyên kûr re bikin yek; Werin em vîn û îradeya xwe bi rêxistinên xwe yên jinan re bikin yek. Werin em stûyê xwe ji şûrên mêraniyê rizgar bikin. Bila ewlekarî û xweparastina me di destê me de be. Ji ber ku di şerê cîhanê yê sêyemîn de xwedî hişmendî, rêxistinbûn û xweparastin çekên stratejîk in di destê jinan de di têkoşîna xwe ya dîrokî de, di ronahiya Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de, bêyî wan em nikarin garantiya tu destkeftiyên bidin. nikarin astengiyên ku li pêşîya me ne derbas bibin.

Her wiha em bang li hemû jin, rêxistin û tevgerên jinan dikin ku di bin sîwana projeya "Konfederalîzma Jin ya Demokratîk a Herêmî û Cîhanî" de tifaqan xurt bikin, têkiliyan xurt bikin, ezmûn û pisporan biguherînin. Em bang li her kesî dikin ku bi hev re û bi bandor bixebitin, dengê xwe bi dengekî bilind û bi hev re bilind bikin da ku cîhanek bê şidet ava bikin, ku tê de aşî û ewlekarî serdest be û jin tê de li gorî felsefeya dirûşma cîhanî ji hebûna xwe kêfxweş bibin. : "Jin, Jiyan, Azadî."

Werin em têkoşînê bidomînin û guhertina ku em lê digerin bi dest bixin!

Nemirî ji bo şehîdên gotina heqîqetê!

Jin, Jiyan, Azadî!

24 Mijdar 2024

Hevgirtina NADA (Hevgirtina Jinan a Demokratîk a Herêmî)

